

Mijara Îbrahîm / Abram / אַבְרָהָם / אַבְרָם / Avraham / Berhîm

Piraniya çîrok û mîtolojiyên li ser bingehên sêwirandin û lihevanîna hatine afirandin, hinên wan mîna rastîyên pîroz bin, bi rêya wergirtinan di pêvajoya hezaran salan de bi kotek û tirsê wisa di mejiyan de dane rûnişin, wan mijareyan vekirin şirovekirin, xistina ber pirsîyariyê her dem rastê bertekên bi awirên tûj, gefxwarinên dijminî tên. Heta carnan dikene bibe egerê kuştinan jî. Lê divê rastî vebin, mijara Îbrahîn-Sara jî ji van mijareyan yek e. Ezê vê carê jî wê mijareyê bi hin daneyan re li ber çavan raxînim.

Ol, bawerî bi giranî li ser avzûna razên mîtolojiyan rûdine. Pîroziya xwe ji wan derhozên (mucîze) ji têngîhiştina mirovî û rastiya xwezayê der digirin. Dema bi şûr, kuştin û sotinan bû tirs jî, êdî xwe digîhîne hêzeke derê xwezayê. Bi hêza wê, psikolojiyeke ji tirsê pêk tê, di giyanan de dide rûniştin. Ev têngîhiştina bi raz dibe tirs û hêzeke xwedayî. Dema bawerî gihîşt vê pîleyê, rastiya wê kirina ber pirsîyariyê dikane bibe egera kuştina mirovan jî. Vê hêza tirsê mîtolojiyan bi milyonan mirov kuştîye, serjêkiriye û şewitandiye. Heta destdirêjahî jî helalkiriye. Lê emê dîsa jî tirsê şûr bidin aliyekê û vê mijarê vekin. Em berê rewşa cîgehên wê serdema ku anegorî baweriyan mijara Îbrahîn /Abraham lê derbas dibe, vekin. Di wê serdemê de li ku çî hebûn?

Li Bajarê Ur (Mezopotamya jêr dor 2000 berê Mîladê)

Ezê di vê lêkolînê de ji şirove û dîtinên xwe bêdir, dîtinên dîrokzan, ramanwer û lêkolîneran derxim pêş, şirove û têngîhiştinê li ser xwinêran bihêlim.

„Di nivîseke mixî de gazinca têkçûna bajarê Ur ku tê bawerkirin çîroka Abaraham /Îbrahîmê li wir destpêkiriye, wek mijar derbasê încîlê, yanê di încîlê de jî heye. Li herêmê derfatên ji dewletbajaran serwerîyeke yekgirtî afirandinê di sala 2100 berê Mîladê bi destê Keyên /padîşahên bajarê Ur ketiye, vê yekitiya serdestiyê hetanî sê nivşan kudandiye...” (1)

„Ur di dawiya 3000 u destpêka 2000 de cîgeheke serbajarê serweran û navendeke təcîriyê bû. Her biryar di bin siya xwedawendê „hivê“ de bû. Lêkolînên arkeolojîk yên di salên 1922 - 1934 de goristana qiralên bajêr, hem rola bajêr û hem jî di biryaran de rola zîgurata xwedawendê heyvê jî bi bingehîn zelal kir.....“ (2)

„Dibe ku Abrahamê /îbrahîmê Xaldean (Chaldäa) yê ku ji bo cihu, xiristiyan û mislimanan kesayetîyeke herî girîng e, hîç nejiyabe...

„... Bajarê Ur di navbera salên 2500 – 2000 berê Mîladê de serbajarekî girîng ya baweriya bi Xedawendê Heyvê bû. Lê dû re ev giringiya xwe wendakir.....“ (3)

Sîlîndîra nivîsandî rewşa bajarê Ur ya salên 2000 î li ber çavan radixîne. Li bajarê Ur ne mirov gorîkirin heye, ne jî sotin. (4)



Di serdema 2090 – 2000 de. Şulgî (keyê Sumerî) û kurê xwe bajarê Ur bi rêve biriyê. Ji wê serdemê re serdema sêyemîn ya Ur tê gotin. Şulgî ji qiralên dadwer yek bûye.

„Zigurata Xwedawendê heyvê „Nana“ bi Sumerî „Etmennigur, her wiha jêre zîgurata Ur jî dibêjin. Di serdema Ur Nammo (hê jî ev nav di nava Kurdan de naveke pîroz e. Gelek caran wek Namet tê bîhîstin) û kurê wî Şulgî de hatiye lêkirin. (5)

Min tenê dîtîne dîrokzanên li ser mijarê ketone nava lêkolînên kûr u hûr girtine. Di ti belgeyekê de navê kesayetiyêke bi navê Îbrahîm, yan jî Tarax tine. Di vê serdemê de ne şewitandin, ne jî serjêkirina mirovan hene.



2000 li welatê Hûrîyan

Em berê agahiyên Universitât Tübingenê bigirin..., „Girê Mozan bi rêveberiya arkeolog prof Peter Pfälzner û Profesorê zanîngeha Los Angeles Giorgio Buccellati tê kolan û nirxandin. Ew li Girê Mozan (Urkêş) Perestgehekê, qesra rêvebiriye, sûra dor bajêr, teraseke mezin, taxeke rûniştîne û xaneke bazarê vedikin. Di wê kolanê de bi hezaran levha û tabletên nivîsandî yên pijandî, mohrên weke sîlîndîr û bê hêjmar nivîsên têkiliyan bi dest dixin.

Prof Giorgio Buccellati li ser mijarê wiha dibêje: „Jureke qirase ya di sala 2600 b, Mîladê hebû. dibe pir pêş de hatibe çêkirin. Komplexa perestgeheke di salên 2700 b.

Mîladê hatî lêkirin. Qesreke mezinê li dor salên 2250 yî de hatiye avakirin, her wiha bin bajareke ji salên 3 hezarî b. Mîladê mayî derket....“ Prof Peter Pfälzner ê karê G. Buccellati domandiye wiha dibêje: „Me 12 qat li ser hev vekir. Gelek zelal e ku bajêr ji 2600 hetanî 1600 berê Mîladê bê navber her şên bûye.“ (6)

"[Ugarit](#) serbajarê mîrîtiya Ugarîti bû, nêzikê çemê Frate ye. Ev bajar ji 2400 berê Mîladê hetanî 1200 berê Mîladê jî cigeheke çand, bazar û tîcîriyê bû..." (7)

„Berê hin agahiyên li ser Hûrîyan (ji wan re Hurre, Hurri, hori Churriter û subarier jî hatiye gotin) Urartû jî ji wan e. Navê Hûrîyan di dawiya salên 3 hezarî berê Mîladê ve di nav nivîsê Akkadan de xuya dike. Li bakur ji Ermanîstanê bigire, tevahiya bakurê Mezopotamya, Başûr-rojhilatê Anatolya, bakûrê Suriyê girtibûn bin bandora xwe. Di salên 1600 b. Mîladê jî bi awayê Mîtanî li paytext Waşûkanî derketin pêş û gelek tabletên wan jî li bajarê Hetîtan Hatûşaşê derketin û hatin xwendin.....“ (8)

Têbînî. 1 – Li Muzeya Berlînê beşeke hurîtologî heye. Kesê bixwaze dikane, li wir binêre. 2 – Gelek nivîs û nirxandinên min jî li ser Hûrî û Mîtanîyan hene. Lê min xwest bila di vê gotarê de tenê nirxandinên pisporên biyanî hebin. Hima bigire hemû tabletên bi Hûrî – Mîtanî, Li bajarê Ugarîti tabletên (li dor 2000 b. m.) bi zimanên din jî derketine, tev de hatine xwendin di ti tabletekî de navê Abram, Abraham (Îbrahîm Erebi zimanekî pir dura ye û jî zimanên herî melez yek e), Sara, Hacer Îsmâil û Îshaq derbas nabe. Heta di tabletên li ser koçberan de jî naveke wisa, yan jî navê tarîqatekî wisa tine û tine. Yanê bingehe wê yê dîrokî tine.

2000 berê Mîladê Kenaan / herema Levante (Ji Lubnanê hetanê Sînaî)

Di malpera kovara cidî „Magazin Spiegelê de ev mijar bi vê serenavê tê vekirin: „Hey paytextê vala! Ma Xwedê 2000 salî ye?“

Arkeologan li Îsrailê perestgeheke baweriyê xwezayî û pûtekî zêrkirî dîtin. Ev dîtinên arkeolojîk yên nû li ser baweriyên cihanî yên yekxwedayî (Monoteist) dîtinên nû derxist pêş.

Ji Misra qedîm derketin û hatina cihûyan di ti demê de nebûye, (tiştek wisa di dîrokê de tine û tine) Pirtûka Yosuna nivisiye ku Kenaan bi xwînxwarî hatiye girtin, lê rastî ne wisa ye. Serweriya Davud û Suleyman tenê lihevanîn in, ne rast in. Van mîrên Îsrailîyan tenê hin cihên kenar yên ne giring di sewiya gundan de bi rêve birine. (Ji Finkelstein: Mixabin ev çîrokana weke rastî derbasê îslamê jî bûne.)

Vegotina qiral Chr Josiah di sala 639 - 595 de li dij pirxwedatiyê şerkiriyê û yekxwedayî aniye, tenê çîrçîrok e, ti têkiliya xwe bi rastiyê re tine. Tenê karkerên cihû bi demî çûne Misira qedîm, li wir xebitîne û dû re vegeryan e....

Mînak dîroknûserê Grêk Herodot ê di 430 berê mîladê de li ser dîroka Rojhilata navîn nivîsiye, hîç behsa Îsrailîyan û xweda Jahwe /Yahova nekiriye?“ (Ev çawa dibe?) (9)

„Bajarê Ericho ne tê de bajarvaniya Levante (Herema Kenaanê) pir dû bajarwaniya Misira qedîm û Mezopotamyayê destpêkiriye. Bajarên destpêkê yên li herema Levante li dora 2100 î berê Mîladê hatine avakirin, cihên tîcareta di navbera şarestaniyan de tim vekirîbû.“ (10)

„Niştecihên Filistînê yên di salên 3500 berê Mîladê de mirovên ji Beerşewa bûn, Niştecihên Kenaanê li dora 2000 berê mîladê dest bi cih guhertinê kirine. Dor 1700 berê mîladê de fraunên Hîksosê yên li dora çemê Nîl ev der kirin bin bandora xwe....“ (11)

Rengê qiraliyetê bi navê („Quelle der königlichen Farbe war die Purpurschnecke.iya“) kapûşkî bû. Wan bixwe ji xwe re Fenîkeyî nedigotin, xwe bi navê bajarên xwe weke Byblos, Sidon û Tyros bi nav dikirin. Çanda ku dû re wek fenîkeyî hate nasîn 3 hezar sal berê Mîladê kemilî bû. Ev bajarên li devera Levante ku ji Lûbnanê hetanî Surî, Îsrailê li peravê Derya Sipî dirêj dibe. Ew gelên wan bajaran gelekî xwedan azmûn û keştiyên deryayî bûn, hetanî sedsala şeşan berê Mîladê jî nav û dengê wan hebû. (12)

„Ji berhema; Lêkolînên arkeolojîk ên dîroka pêş û destpêka zû ya zanîngeha Würzburger weşangerê xebatan Frank Falkenstein û Heidi Peter-Röcher /Band 7

„Bajardewletên başûrê herema Levante ku lûbnan Îsrail û hetanê şerîda Gaza ya Flistînê di dawîya serdema bronz û destpêka serdema hesin de di bin bandora Faraonan de di sedsala 12 berê Mîlade hatine avakirin, gelek gelên cûda lê jiyan e. Her wiha mirovên deryayê (fenîkeyî) jî...“ (13)

Bandora Misira antîk di 2000 berê Mîladê de li herêma Kenaanê bû. Levhayê pijandî yên li Tel el-Amarna Misirê hatiye dîtin bi aşîkarî dinivîse ku serweriya herêma Kenaanê ji aliyê Misira antîk ve hatiye birêvebirin. Xwerû jî di serdema bavê Exnaton Amenhotep III. ve. (14)

Anegorî baweriyên Kurte Çîroka Îbrahîm

A - Li gor Tewratê Abrahamê kurê Terach ji ber zulma Akadan tê Haranê. Du jinên wî hene, yek Hacer e, yek jî Sara ye. Ji Hacerê Ismael û ji Sarayê jî Îshaq tê dunê. Sara dema ji Îshaq hemîle dimîne li ser heftêyî re ye. Îbrahîm soz daye xwedê ku kurê xwe têke qurban. Bîsta dixwaze Îshaq serjêbike, şûr stuyê Îshaq nabire, kêliya şûr li kevir dixê, kevir parçe dike. Dû re Xwedê di cihê wî de beranekî dişîne. Abraham wî dike qurban. Încil jî wekî Tewratê radigîhîne.

B – Di Qurane de jî mijar hima bigire wekî ya Tewrat û Încîlê ye. Bes, di Quranê de tê ragihandin ku Îbrahîm di cihê Îshaq de dixwaze Îsmail bike qurban. (Cüz 13, Rûpel 258, Sûreyê İbrahim"Elîf Lam Ra",Ayet: 25-33)

Çima ev navên cuda? Ji ber ku Cihû bawer dikin ku ew zarokên Îshaq in. Di îslamiyetê de jî tê bawer kirin ku Muhammed ji neslê Îsmâîl e. Di hin hedîsan de tê ragihandin ku Hz. Muhammed gotiye ez di 25 bavan de digihîjim Îsmâîl. Lê li gor mîtolojiyê Îbrahîm /Îsmâîl teqriben 3000 sal berê Muhammed jiyaye. Eger her bavek 150 sal jiya be, dibe.

C – Gelê me jî bawer dike ku avzûnkarekî ji qiral Nemrût re dibêje, wê îsal zarokek were dunê û hemû peykerên te biruxîne. Ew berê hemû mêran ji bajêr derdixe, tenê bi Nobedarê pûtan bawer e, wî ji bo xwarin û pêdiviyan dişîne. Ew têkilî bi jina xwe re datîne. Jina wî hemîle dimîne û di şikefta Ruhayê de Îbrahîm tîne dunê. Hetanî ew dibe şazdeh salî jî di şikeftê de dimîne, Dû re bi şev derdikeve, gava hîvê dibîne; dibêje; „Xweda ev e!“ Piştra bi derketina rojê re dibêje; „na Xweda roj e.“ Di encamê de jî ji Xwedayê di hînavê xwe de bawer dike. Pûta dişkîne. Nemrut jî wî davêje agir, agir xwe diguhezîne gola avê û kizot jî dibin masî û û û.



Wateya ji bo qurbanê hatina beran çi ye?

Berê li Mezopotamyayê jî ji bo xwedawendan mirov, bi giranî kole, yan jî kesên dîl hatî girtin dikirin gorî. Piştî demekê êdî di cihên mirovan de Conega û beran ji bo xwedawendan kirine gorî. Zanyar di wê baweriyê de ne ku ev mîtolojiya Îbrahîm û xwasteka kurê xwe gorîkirinê, mîtolojiyeke vê pevajoya rakirina mirovgorîkirinê ye.

Îbrahîm kî ye kesek wisa di dîrokê de jiyaye?

Ev mîtolojî ji vegotinên Cihuyan bela bûye. Lê dibe ku Cihûyan ev çîroka ji Mytolojiya Brahma û Saraswatî ya Sankirîstan /Hînt wergirtibin. Ji ber ku li Rojhilata-navîn ti belgeh û nîşaneyêke vê mîtolojiyê tine. Zanyar li ser hin dibekûyan radiwestin. Em wan bi awayê angaştan vekin:

Angaş :

1 – Çîroka Abraham /Îbrahîm ji mîtolojiya Sankirîstan „Brahma (Brahmanan) û Saraswatî“ hatiye wergirtin, lewra çîroka Sankirîstan ji ya Îbrahîmê li Rojhilata-navîn bi kêmasî hezar sal kevintir e. Navê pexemberê Samiyan Abram /Abraham /Îbrahîm û navê hevjinê wî Sara ye. Li ba Sankirîstan jî mîtolojiya Brahma / (A)Brahman û Saraswatî heye. Gelo ewqas tesadûf dibe? Tenê cudahiyeke di navberê de heye. Di mîtolojiya Sankirîstan de xwîn rijandin tune, guneh e. Mêwe û kulîlkên cûda pêşkêşkirin heye. Samî birçiyên xwînê ne. Ji ber ku heman çîrok in. Dibe ku tucarên Cihûyan ev ji Hîndîstanê anîbin, yan jî Guruyên hîndîstanî hatibin Mezopotamyayê û Cihuyan jî ev çîrok ji wan vegotibin, rengê wê hinek guherîbin û ji xwe re

kiribin mal. Ma wan gelek mîtolojiyên Mezopotamyaye jî ji xwe re kirine mal, çima vê jî nekin?..”

Çavkanî: Aus Vollmer's Mythologie aller Völker, Stuttgart 1874

Ev angaştê Vollmars Mythologîe agnaştê herî zêde nêzîkê rastiyê ye. Çima?

1 - Di ti belgeyên arkolojîk û dîrokî de kesekî, yan jî çîroka kesekî bi navê Abraham /Îbrahîm û Nemrût derneketine û di ti tableteke nivîsandî de jî tiştek wisa tine. Ji ber vê egerê jî Îbrahîm ne kesekê dîrokî tenê kesekê mîtolojîk û wêjeyî ye û çîroka wî jî, her wisa. Bes di dema Salmanasar I. û kurê wî Tukultî- Nînurta I. de û li gor daneyan berê wan jî wek ceza mirov avêtine firinan. Lê di ferzên Tewratê yê 12 û 25 an de radigîhîne ku Îbrahîm 2000 - 2500 sal Berê Mîladê jiyaye. Salmansar û kurê xwe Nînurta I di navbera 1280 – 1200 jiyane. Ango hima hima di serdema Musa de jiyane.

Çavkanî: Navigator Allgemeinwissen

2 – Mijara Îbrahîm (bi çî navê dibe bila bibe) bi Ruha û Antîoxozê (Antiochos I, II, III.) re yê ku keyê Komeganê ye re, yanê bi peykerên çiyayê Nemrûtê ve girêdan jî ne rast e, heta bê mejîtî ye. Lewra ev serkariya Komeganê di navbera 100 sal Berê Mîladê û 100 sal jî piştî Mîladê de hebû û berê wê tinebû. Hima mijara Musa û Fraonan 1300 sal Bere Mîladê bû. Li gor mîtolojiyê Îbrahîm herî kêr 1000 sal berê Musa jiyaye.

3 – Ew keheha Ruhayê û herdu stûnên di nava kelehê de 2500 sal piştî çîroka Îbrahîm, yanê bi destê mîrîtiya Osrehoana li Edessayê (Ruha) ku bi Romayîyan ve girêdayî bû ve hatiye lêkirin û ti tîkiliya wê bi mijara Îbrahîm û Nemrût re hîç tine, tenê di bîra gelê me de wisa rûniştiye.

4 – Gola Masiyan,

Di nava parqa bajêr de du gol hene, yek “gola Masiyan” e û bi berahiya 150 × 25 mêtreyî ye. Yek jî gola “Ayn-î Zeliha” ye, ew jî bi berahiya 30 × 50 metreyî ye. Herdu gol jî di bin ve bi qanaleke bin erdê bi hev ve girêdayîne û golên çêkirî ne, ne golên xwezayî ne. Berê şeteka çemoka ku di nava Ruhayê re derbas dibe, di vir re diçû. Lê di dema Eyubîyan de ew tê qutkirin. Ti tîkiliya wê jî bi Îbrahîm re tine.

5 - Cejna gorîkirinê yan jî Eydiya Heciyan:

Gorîkirin pir berê dînê îslamê jî di nava piraniya gelan de hebû. Heta li Girê Mirazan /Xirabreşkê ku 11000 sal berê îslamê wek parastgehekê hatiye avakirinê jî, nîşaneyên gorîkirinê derketine. Bê wê ta jî Înkayên Amêrîkaya Latînî bigire, hetanî digîhîje Çîn û Japonyayê yê jî gorîkirin hebû û heye. Mînak: li Mezopotamyayê tê ragihandin ku canega ji bo Xwedawendan hatiye gorî kirin. Li Misira Fra'unan canegayê ji bo gorîkirinê hatî hilbijartin, dibirin ber destê keyxwîdayên bawerîyan, wan ew di ber çavan re derbas dikirin. Eger baş bidîtana mohrekê lê didan, hê dikanîbû bihata gorîkirin.



Kabeya kevin

Ti lêkolînên arkolojîk û teknîka demjiyanan li ser Kabeyê pêk nehatiye. Ji xwe ku rayedarên serkariya Ereba destûra lêkolîn û zanyariyên arkolojîk nadin. Dema bidin wê rastî derkeve. Tiştên ji zanyariyê hatibin qetandin jî, tenê di nava çarçoveya dazanînên baweriyê de dimînin û dibin çîrok û mîtolojî. Dema diyardeyekê bû mîtolojî jî, her gel dikane di nava çarçoveya baweriyê xwe de teşe û rengêkî yan jî wateyeke wê mîtolojiyê di nava têgîhîştina xwe de pêşkêşê nivîsê li pey xwe bike. Îslamiyet jî di nava vê çarçoveyê de nêzîkî Kabeyê dibe û wê di siya razên xwe de şirove dike. Heta agahiyên dema cahîlîyeyê jî, weke fermaneke di nava çarçoveya bîrdoza xwe de dide, pirsên li ser jî hîç napejirine, pirsîyariyê weke gunehkariyê dibîne û dinirxîne.

Kabeya nû

Di baweriyê îslaman de Îbrahîmê mîtolojîk û kurê wî yê mîtolojîk Îsmâîl hetanî Mekkeyê hatine û ev Kabe avakirine, lê divê mirov nepirse, nebêje „Çima, ji bo çi ew avakirine û çima li vira? Ma cihekî din tinebû? Çima li Heranê yan jî li Qudusê ava nekirine? Di vî derbarê de çi belgeyên zanistî hene? Li gor dîne îslamê, dema mirov bi pirsên wiha daxwaziya rastiye bike, gunehkar dibe! Dibe cudexwaz! Ne gotina min e, Ereba wer dibêjin! Mîlyarek mirov jî bawer dikin.

Li gor îslamê berê bawermendên Îsmâîl û Îbrahîm di dema hecê de hatine, ew der ziyaret kirine û bûne hecî (ti belge tune, tenê bi gotina wan), pişt re mirovan ew ji bîr kirine û Pûtên xwe yên bi navên cûda, wek „El îllah“ û wekî din kirine Kabeyê û tê de parastine, di dema hecê de jî hatine, pûtên xwe derxistine, qurban ji bo pûtên xwe ser jêkirine. Îslamê jî ev kevneşopî wergirtiye û kiriye şerteke îslamê!

Li gor daneyên dîrokî yên heyî, tê zanîn ku ta di dema împaratoriya Saba de jî her eşîreke Ereba bi Xwedawendekî bawer dikir. Wek sembola wî xwedawendî peykerek çêkiribûn. Lê ji ber ku koçer bûn, li çêregehan digeriyan, nedikanîn sembolên xwedawendên xwe bi xwe re bigerandana. Ji ber ku Mekke wek navendeke tîcaret, tîkiliyan bû. Li wir jî bo parastin û bicihkirina peykerên sembola xwedawendên xwe parastine avahiyekê ji bo wan lêkirine û di wir de parastine. Heta tê zanîn ku wek nobedar kesek jî ji bo parastinê dane ser wir. A ew avahî bûye Kabe. Çîrok ev e.



Ew kevirê „Hacer - ûl Eswet“ kevirêkî Meroît e. Meroît li ser reşahiyê ne. Li dor gelek çiyayên agirî û deren Meroît lê ketine, tîn dîtin. Meroîtên spî tunene.

Brahman û venivîsandina wî

Em venivîsandina wî ji şirove û dîtinên xwe bêtir ji çavkaniyên wan bigirin. Bila şirove ji xwinêran re bimîne.

„Brahman li Hîndîstanê Xwedayê herî payeberz û afîrîner e. Anegorî baweriya Hîndîyan ew bê guhertin, bê mirinê tewaw û berziya bê gîhîştin, giyana ne di teşeyê mirov de ye. Ew yekem hêza ku li cihanê bi bandor e....“ (15)

Sembolîzekirina Xwedawend Brahman:

„Wênayê wî bi çar serî, çar rû, bi çar mil û destan hatiye neqîşandin.

Bi giranî li ser kulîlka lotûsê tê nîşandan, hin Hîndî wî wek kurê Vîşnû dibînin.

Di nivîsên Rîg Vedayê yê kevn de ew wek tîgîgîhîştina zanînê, yasaya xwezayê û sembola zanînê tê venivîsandin. Wateya hin tîgînan:

Kulîlka Lotûsê = jî sembola Brahman ya afîrîneriyê ye.


Japa Mala = gerdaniya kulîlkan e.

Guru = Pîrên baweriya hîndîyan e.

Kamandalu = Tasika parsê / geştê ye. (16)

Sarasvatî

Di mîtolojiya Hîndîyan de Sarasvatî hem wek xwişka Brahman û hem wek hevîna wî hatiye destnîşankirin. Ew bi awayê xwedawendê hişmendî, huner, muzîk, zanîn û xweşikîyê hatiye venivîsandin. Li Hîndîstanê herî zêde ew tê hezkirin. Her wiha ew wek hêza Brahman ya jin (Shaktî) tê zanîn. Divê em vê jî bibêjin; çemekê berbi Pakîstanê diherike heye, navê wê jî Sarasvatî ye.(17) û tîkiliya wan bi hev re heye.



Têkiliya Abraham /Îbrahim û Brahman çi ye?

„Tê gotin ku Abraham û Sara anegorî daneyên hemdemî li dora 2000 sal berê mîladê jiyane!. Di wê serdemê de jî hin eşîrên „arî“ koçberê bakurê Hindîstanê dibin. Peyva „arî“ peyveke Sanskirîstî ye û tê wateya kesên bi esil....“ (18)

Niha jî em vê pirsê bikin: Rastiya Abraham /Îbrahîm çi ye?

Ezê di cihê şiroveyê de nirxandina di „Gene D. Matlock, BA, MA“ de wergerînim kurdî, yê bixwazin mijarê hê berfirehtir bixwîne (bi almanî ye) dikane lînkê veke, wergerîne zimanê ku têdigihîje û bixwîne.

„Zanyarê baweriya Cihûyan Flavius Josephus (salên 37 – 100 piştî Mîladê jiyaye) di berhema xwe ya „Dîroka Cihûyan“ de wiha dinivîse: „Fîlozofê Grêk Arîsto Thales wiha gotiye „... Ev Cihûyana jî baweriya hîndîyan û jî Hîndîstanê ne. Li Hîndîstanê jî wan ra „Calanî“ dibêjin. (pirtuk I: 22)

Clearchus von Solî jî wiha dinivîse: „Cihûtî jî fîlozofîya Hîndîyan qetyaye. Ev fîlozofîya li Hîndîstanê weke Calaniyans, li Suriyê jî weke Yahûdî tê binavkirin. Bilêvkirina navê paytextê wan gelek dijwar e, „Yeruzalem“

„Megasthênes ê 300 sal berê mîladê bi aliyê keyser Seleucus Nikator ve jî bo Hîndîstanê wek mîsyoner hatibû şandin. Geştê xwe ya li Hindîstanê roj bi roj nivîsiye. Ew li ser mijara Cihûyan jî wiha radigîhîne: „Cihu eşîreke yan jî tarîqateke Hîndîyan ya bi navê Kalanî ne.“ (Anacalypsis von Godfrey Higgins, Bd. I. Ru: 400)

Martîn Haug, Ph.D Di berhema xwe ya bi navê „The Sacred Language, Writings, and Religions of the Parsis“ de wiha dinivîse: Magier / îlîzyonîstan jî ol / baweriya xwe re „Kesh-î-Ibrahim“ digotin. Wan pirtûkên xwe bi Abraham ve girêdidan. Bi rengekî wisa vedigotin, mirovan wer zendikir ku wan ew berhem jî ezman anîne xwarê.“ (Rû: 16)

Nizanim pêdivî bi şiroveyeke din heye?

Yekitiya di cîroka Brahman û Îbrahîm de

Ezê şirove nekim, tenê zelalkirinên zanyar û lêkolîneran wergerînim kurdî:

„Xweda Brahman – Saraisvatî û Abraham – Saraya Cihuyan bi her aliyê ve wisa bi berfirehî dişibin hev, ne mumkune ku tesaduf be. Her çendî li Hîndîstanê tenê perestgeheke Brahmanî hebe jî, kulta Brahman di warê mezinahî û bawermendan de tarîqata di rêza sisyan de ye.

Nivîskarê Meksîkanî Tomás Doreste di berhema xwe ya bi navê „Moisés y los Extraterrestres“ dinivîse ku fîlosof Voltaire gotiye; „Baweriya Abraham jî ruhaniyên Brahmaniyên hîndîstanî, yê jî Hîndîstanê derketibûn ku Brahmanî li cihanê bele bikin,

derketiye û li ser wê bingehî rûniştiye. Ew vê jî lê zêde dike; bajarê Ur nêzîkê sînore Persan e, rêya ticareta Hîndîstanê û rojhilat jî di wir re derbas dibe.“

Brahmanî li Hîndîstanê di radeyeke gelek berz û bi rûmet de dihat dîtin, bandora wê li tevahiya Îranê jî bûbû. Ev hetanê navbera çemê Frat û çemê Tîr (Dicle) jî hatibû. Li pey jî dihat gotin ku Xwedê ji Baktîrien tê (herêmeke çiyayî ye) Rêya Hîndîstanê jî di wir re derbas dibe.“ (Rûpel 46-47) Baktîrien (devereke li Afganîstanê ye), ew dever cigehekî weke cihê Cihûyan bi navê Juhuda (Yuhuda) yan jî Jaguda /Yaguda hem jî weke Ur-Yaguda hatiye binavkirinê. Dema Încîl li ser vê mijarê „Ur Xaldäer (Chaldäer)“ dibêje, ev di bin navê „Kaul Deva“ (kaula pîroz) de jî dihat zanîn, di rastiye de ew nav ne navê cigehekî navê kastekî ruhaniyên baweriya Brahmanî /Hîndî bû. Ew li Afganîstan Pakîstan û Kaşmîra Hîndîstanê dijiyan...”

Divê bi mijarê re têkildar ew jî were gotin; Bavikê „Ioud“ yan jî Brahmanê Abraham, ji Hîndîstanê hatibû qewitandin, yan jî bixwe ji Maturea Hîndîstanê ya qiraliyeta Oude ya li Hîndîstanê qetyabû, hatibû Goşin, yan jî cihê bi navê mala rojê /Heliopolisa li Misira qedîm. Navê wê cigeha Hîndîstanê „Maturea“ ya ew jê qetyabû dabûye (Pituka Anacaliypsis; Bd. I. Rû 405)

Divê ew jî were gotin: Faris Erebb û Cihû xwe bi bavik Îbrahîm ve girêdidin.

.... Tê gotin ku Terahê bavê Abraham ji welatekî rojhilat ya bi navê Ur ku li Mezopotamya jêr di destê Chaldäer de bûye, demekê maye (Ji min; yanê ew ne Xaldearî ye.). Pişt re Abraham, Abram yan jî Brahman bi tevê hevîna xwe Sara, Sarai, yan jî Saraswatî ji mala bavê xwe qetyaye û hatiye Kanaanê. **Berê mîsyonerên Jesuitî behsa nasnameya Abraham û Sara bi tevê Brahman û Saraswatî kirine.** (Bd, I. Rû. 387)

Di mîtolojiya Hîndîyan de Saraswatî (Sarai-Svatî) xwişka Brahman e. Încîl du çîrokên Îbrahîm vedibêje. Di fersiyano yekem de li ser Abraham /Îbrahîm ji Fraunê Misrê re dibêje; „dema wî Sara wek xwişka xwe pêşkêş kiriye derew kiriye!“ Lê di ferziyona dudayan de jî ji qiral Von Gager re dibêje; „Bi rastî jî Saray xwişka wî ye.“ Dema qiral ji ber derewê wî hêrs dikeve, ew bersiva; „Sara hem xwişka wî û hem jina wî ye!“ dide. ... Û dibêje; „ Ew xwişka min e, keça bavê min e, lê ne keça diya min e (tenê diya wan cuda ye, bav yek e) (Genesis 20:12.)

Bes, ew şibandin yan jî heman çîrokbûna wan li vir naqede. Li Hîndîstanê çemê Xacer (Ghagger) pilekî çemê Saraswatî ye navê pilekê wê jî çemê Hagra ye. Anegorî çîroka cihûyan Hacer berdestiya Sara ye. Misliman dibêjin ew li misirê prenses bûye. Tiştê girîng ew e; di herdu çîrokan de jî wekheviya Ghaggar, Hagra û Hager (Hacer) heye.

Di Încîlê de dinivîse ku Îsmael kurê Hacerê ye û merivên wî li Hîndîstanê dijîn. „... Îsmaîl henasa dawiyê hilda û mir, merivên wî li hev civiyan.... Ew li Havîlayê (Hîndîstan) dijiyan, her wiha li Şura nêzîkê Misrê û li Asûr jî hebûn. (Genesis 25:17-18.)

Rastiyeke balkêş jî ew e:

Ji heman berhemî:

„Navên Îsaak û Îsmael jî ne peyvên hebreyî yan jî erebî, peyvên Sankirîstî ne. Bi Hebrêşî Îshak, bi Sankirîstî Îşakhu = Hevalê Şîva. Bi hebreyî Îsmael, bi sankirîstî Îs-mahal = Şîva yê mezin.

Wekheviya sisyan ya çîroka Abraham û Brahman jî tofana baranê ye. Di Încîlê beşa „Nuh“ de wiha tê nivîsandin: Em dizanin ku tofaneke baranê Îbrahîm ji Hindîstanê qewitand. Çîrok wisa didome: „... Xweda Xwedayê Îsraîl wiha dibêje; Bavê we, berê li wiyalî cihê tofanê dijiya. Heta Terax, bavê Abraham û bavê Naxors bi xwedawendên din bawer dikirin. U min bavê we Abraham ji wiyalî tofanê girt li tevahiya welatê Kanaanê gerand.“ (Josua 24:2-3.)

„Di sala 1900 berê Mîladê de çemê Sarasvatî dimiçiqe. Vê hişkahiye jî gelê newalên Sindhu û Sarasvatî di divêtiya koçberiyê de hîşt. Dibe koçberiya berbi rojava (Îran, Mezopotamya, Yunanîstan) di wê serdemê de pêkhatibe. Demekê dû wê re gelek elementên bawerî û filosofiya Hîndî di nava Grêk, baweriya gelên Mezopotamya û Misira qedîm de xuya dike. Çavkanî „Indic Ideas in the Graeco-Roman World, von Subhash Kak, entnommen aus dem Online-Literaturmagazin IndiaStar; S. 14)“

Têbinî: Dîrokzanê Hîndî Kuttikhat Purushothama Chon jî behsa mijareya baweriya bi Abraham ya ji Hîndîstanê derketiye dike. (19)....“

Lêkolîner Steven Rosen jî li ser heman mijareyê radiweste:

Li ser mijara hemankesbûyîna Îbrahîm /Abraham û Brahman nîrxandina bi dehan filozof, dîrokzan û ramanweran hene. Ji vana yek jî Steven Rosen e û di malpera „Akademîa.edu“ gotareke berfireh nivîsîye. (20)

Mijara Îbrahîm û hin pîroziyên li Ruhayê (/Edessayê)

Mizgefta „Ayn-i Zeliha ve Halil-Ür Rahman“

Hin berhemên dîrokî yên li Ruhayê, berhemên baweriya „paganî“ ne, ti tîkiliya xwe bi baweriyên Samî re tine. Lema jî divê ji bo zelalkirina vê mijarê, em berê peyv û baweriya „paganî“ bi hin alîyan ve zela bikin. Ev peyv li gelek herêmên Kurdistanê navê cigehan e jî, mînak; Perestgeha Paganê ya li gundê Pagana ku girêdayîye navçeya Wanê Mehmûdîyê (Saray) ye.

Peyva „Pagan“ ji bo baweriyên xwezayî tê bikaranîn. Dibe ku ev peyv ji peyvên „pa /pak“ û „ga“ pêkhatibin, tîpa „n“ jî paşgîna piraniyê ye. Di sumerî de „gan“ tê wateya, dayîk, xwedaya dayîkî. Bi Akadî = „ba /babû“, bi sumarî „bî, ba“ = di wateya derî, rê û rêbaz de ye. Ev bi awayekî tê wateya rê û evîna dayîka afrîner. Lema jî Asûrî-Suryaniyan piştî di sedsala 500 piştî mîladê baweriya xiristiyani pejirandin, ev peyv, ji bo baweriyên xwezayî, yan jî kurdistanî bikaranîne. Niha jî hemû baweriyên xwezayî di bin vî navî de tên binavkirin. Bi gotineke kurt „pagan“ ji bo baweriyên kurdistanî tê bikaranîn. Yanê ne baweriyên Samî.

Anegorî daneyên berdest berê li vir Perestgeha „Pagan“ (baweriya Hûrî-Mîtanî /baweriya xwezayî) hebûye. Pir dû re jî di navbera salên 1000 -300 berê Mîladê de ji bo xwedawenda „Atargatîs“ ku weke masîmirov hatiye venivîsandin, hatiye nûkirin û berfirehkirin. Atargatîs şeweyeke şahmaranê deryayê ye. Anegorî baweriya serdemê li gel perestgeha Atargatîs hewzên mesîyan jî dihatin çêkirin. Hê îro jî li gelek cihê Lubnan, Sûriye û Îsrailê hewzên masîyan yên masîyên wan pîroz tên dîtin û nayên xwarinê hene. Lema gelek dîrokzan û lêkolîner di wê baweriyê de ne ku ev gola masîyan ya li Ruhayê jî berê parekê wê perestgeha Atargatîs bûye.

Dîrokzanê Grêk Ctesias von Kîndos di nivîsên xwe de jê re „Derketo“ Romaiyan jî ji wir re „Dea Syriye /Deasura“ gotine. Perestgeha wê ya mezin li Membîçê di nava xirbeyên Hearpolis de bû.

Pisporê îlahiyetê Prof. Dr. Şinasi Gündüz di pirtûka xwe ya bi navê „**Anadolu’da Paganizm**“ (Li Anatolyayê paganîstî) de wiha dinivîse: „Ne tîkiliya gola masîyan, ne jî tîkiliya herdu sitûnên li Urfayê ku qaşo ji bo mancînikê hatiye bikaranîn bi Hz. Îbrahîm re heye. Hz. Îbrahîm anegorî pirtûka pîroz li bajarê Xaldeyîyan Ur derketiye, hatiye Heranê û ji wir jî çûye Kanaanê...“ Ev herdu hewzên masîyan ku bi qanalek bi hev ve girêdayîne, ji bo xwedawend „Atargatîs- Tar`ata“ hatiye çêkirin. Ew herdu stûnên di nav keheha Rûhayê de hê li pê ne jî, piştê mîladê di sedsala 2. de hatiye lêkirin û kîtabeya wê jî hê heye û tê xwendin. Li gel van rastiyan tê bawerkirin ku Hz. Îbrahîm berê mîladê di navbera 2000 – 1800 de jiyaye.“

Hûn dikanin di vê çavkaniyê de jî vê rastiyê bixwînin: (a)

Mizgefta HALİL-ÛR RAHMAN

Mizgefta Halil ür-Rahman li gel gola masiyan e. Di nava gel de jê re „Mizgefta raxistî“ jî dibêjin. Keşeyê nav „Urbisyus“ di sala 504 an de li vir bi navê diya Îsa „Meryemê“ kîlîseyekê avadike (Ji min: Anegorî belgeyên berdest ev kîlîse li ser perestgeha Atargatîs, perestgehe Atargatîs jî li ser perestgeha pagan avabûye.) Ev wek dêra /kîlîseyê Hz. Meremê derbasê qeyd û belgeyên Roma û Bizansan dibe. Yanê bi delîl û îspat e. Xelîfeyê Ebasî „Me`mun“ di sala 813-833 an de vê kîlîseyê diguhezîne mizgefta mislimanan. Biraziyê Selhedînê Eyubî El Melik’ül Eşref Muzafferüddin Musa jî di sala 1211-1212 an de mînareyên wê tamîrkiriye. Kanûnî Sultan Sulêyman jî di navbera 1520 -1566 an de wê mizgeftê restore dike. (b)

çavkaniyeke girîng jî ev e.

M. Rostovtseff, "Hadad and Atargatis at Palmyra", *American Journal of Archaeology* 37 (January 1933), pp 58-63, examining Palmyrene stamped

Mijara Nemrût

1 - Navê Nemrut pir dû re li gireke çiyayê Nemrût peykerên xwedawendên serweriya Kommeganê ku bi aliyê Antîchoz I. ve di salên 70 yî piştê mîladê de hatine teraştin û gorna Antîxoz jî li wir e kirine. Di nava gel de jê re pûtên Nemrût jî dibêjin. Lê ti tîkiliya wê bi Nemrûtê çîrokî yan jî ew karekterî dijber ya di nav çîroka Îbrahîm de heye re tine.

2 – Ji çiyayê agirîn ya li rojavayê gola Wanê re jî çiyayê Nemrût tê gotin. Ti tîkiliya wê jî bi Îbrahîm Xelîlah û dijberê wî Nemrût re tineye.

3 – 30 km. li başûrrojavayê bajarê Musilê kavîlên kevnebarekî heye, navê wî yê orjîn bi Asûrî „Kalxû“ lê ji ber ku ew der demekê paytextê Asûran bû, ji wir re jî bajarê Nemrût tê gotin. Bes tîkiliya wî jî bi Nemrutê çîrokî re tine.

4 – Û Nemrût /Nînurta qiralê Asuran

Dîrokzanê Alman Dietrich Optîz di berhema „In der Propyläen Weltgeschichte“ Band I. de di bin sernavê „Königs (key) Tukultî Nînurta I. von Assurien“ de weiha dinivîse: „Dema pisporên arkolojiyê yê Alman li Assur (Iraqê) cihê dîrokî dikolan, tabletek, ango li ser kevîrekî kîlsê nivîsê mixî dîtî, wê tableta ji kevîr ti xisar nedîtibû. Di wir de dinivîse ku ew 1250 sal berê mîladê hatiye nivîsandin!“ (c)

Têbiniyeke balkêş: Nivîserên destana şerê padîşahê Kassitan Kaşîlîyaş û Tukultî Nînurta bi asûrî nivîsiya bi tevahî şerê Hîfîtan û Fraunan ya li Kadeşê qopya kiriye û bi wê pesna Nînûrta /Nemrût daye. Hûn dikanin di vê derbarî de li nirxandina Oskar Kaelin ya di bin vê serenîvîsê de binêrin:

„Das Tukultî-Ninurta-Epos und das ägyptische Qadeš-Schlacht-Poem Ideentransfer in der Inszenierung eines assyrischen Herrschers“ Oskar Kaelin (Destana Nînurta /Nemrût û Kaşîlîaş û şerê Kadêşê)

Têbinî: Di dîrokê de tenê navê qiralê Assuran Tukultî Nînurta, nêzikê navê Nemrût e. Bê vê ti naveke din tine. Navê heyê tenê navê çîrokî ne û ti tîkiliya wan bi arkeolojî û rastiyên dîrokî re tine.

Bi gotineke kurt ti belgeyeke hebûna Nemrûtê dijberê Îbrahîm /Abraham li ber çavan raxîne, tine. Yanê tev de çîrok û mîtolojî ne.

Ev cihê qesra Tukulti – Ninurta I. keyê serdema navîn ya Assuran. (1243-1207 v. Chr.) (d)

Li ser nivîsên Qumran /Deryaça Lût /Derya Mirî

„...Anegorî gotinan hin nivîsên Ruhaniyan (Cihu) piştî ji dîlbûna li Babîlonê rizgarbûnê, yanî li dor 550 berê Mîladê hebûne. Ev agahî jî di nivîseke Grêkî ya 440 b. M. ya di bin navê „panteteuch“ de derbasê nivîsandinê bûye....“ (21)

„...Nivîsandinê Thorayê (başa Tewratê) li dor 400 b. Mîladê hatiye nivîsandin...“ (22)
Schriften (*Chetuwim*) die Hebräische Bibel (*Tenach*)

Bes nivîsa kevn a li ser masûrê ku îro li ber dest heye, nivîsa li Kamrûnê (Gola Lut /Derya Mirî) hatiye dîtinê ye. Mijara nivîsên din ne zelal in.

„ Ev Masûrên nivîsandî (Roleyê nivîsandî) Li dora Gola Lût ku ji sala 120-70 piştî Mîladê ne. Li gel hin qulik û rizandinan nivîsên herî baş hatine parastinê ne....“ (23)



Ji ber awayê paläografîk ya tîpên ku dîroka (mejû) nivîsandina wan li dora 300-100 sal berê Mîladê ye. Ev mejû bi methoda Radiokarbon jî hatiye erêkirin.. piraniya nivîsan bi hebîşî ye...“ (24)

Li gel hin nivîsên di încîlê de jî hene, bi sedan tekstên nayên zanîn û bi nivîsên cûda hene ku ev pencereyê ji bo rewşa wê serdema antîk vedike....“ (25)

Mixabin di sînkronîzekirina tekstên Qumranê û wateyên wan zelalkirinê de hin derdorên bawerî û nijadperest li ser mijarê lîstine. Belê di her mijareyên dîrokî de hin rûpoşandin, bi aliyên din ve kişandin hene. Ji bo vê jî gelek gengeşî û tewanbarkirin hene. Mînak:

„... Di van salên dawiyê di medyayê de hin rexneyên tund jî rû dan. Li hemberê edîtorên hin koman rexneyên tund jî derketin pêş...“ (26)

Çavkanî

<https://www.dasanderemittelalter.net/news/die-klage-uber-ur-und-sumer-2000-v-chr/> (1)

<https://www.uni-wuerzburg.de/forschung/waz/aktuelles/vortraege/aktuelle-vortraege/news/ringvorlesung-aussergewoehnliche-ausgrabungsorte-der-antike-leben-in-einer-metropole-um-2000-vor-chri/> (2)

[https://www.tag-des-herrn.de/content/der-vater-aus-ur\(3\)](https://www.tag-des-herrn.de/content/der-vater-aus-ur(3))

https://www.arithmeum.uni-bonn.de/en/collection/calculating-in-olden-times/object.html?tx_arithinventory%5Bobject%5D=215 (4)

E. Sollberger, *Mr. Taylor in Chaldaea*, *Anatolian Studies* (1972) (5)

[/www.wissenschaft.de/allgemein/hurriter-grossmacht-im-alten-orient/#:~:text=Ein%20r%C3%A4tselhaftes%20Volk%20taucht%20auf,wurden%20sie%20besiegt%20und%20vergessen.](http://www.wissenschaft.de/allgemein/hurriter-grossmacht-im-alten-orient/#:~:text=Ein%20r%C3%A4tselhaftes%20Volk%20taucht%20auf,wurden%20sie%20besiegt%20und%20vergessen.) (6)

https://opus.bibliothek.uni-wuerzburg.de/opus4-wuerzburg/frontdoor/deliver/index/docId/7240/file/Wilhelm_OPUS_7240.pdf

<https://www.uni-goettingen.de/de/75086.html> (7)

Technische Hochschule Mittelhessen

<https://homepages.thm.de/~Hurrisch-Urart> (8)

<httpshttp://magazin.spiegel.de/EpubDelivery/spiegel/pdf/25990839> (9)

https://globalhistory.de/historische_regionen/kanaan.aspx (10)

[://www.wissen-digital.de/Israel_\(K%C3%B6nigreich\)](://www.wissen-digital.de/Israel_(K%C3%B6nigreich)) (11)

<https://www.nationalgeographic.de/geschichte-und-kultur/wer-waren-die-phoenizier> (12)

https://opus.bibliothek.uni-wuerzburg.de/opus4-wuerzburg/frontdoor/deliver/index/docId/24241/file/978-3-95826-167-9_WueStVFA7_OPUS24241.pdf (13)

<https://www.bpb.de/shop/zeitschriften/apuz/267337/irdische-geschichte-einer-heiligen-stadt/> (14)

<https://religion.orf.at/v3/lexikon/stories/2581491/> (15)

<https://karmandala.de/blog/brahma/> (16)

<https://www.planetenklang.de/sarasvati/> (17)

<https://www.saraswati-bollydance.com/%C3%BCber-uns/wer-was-ist-saraswati/>

<https://www.juedische-allgemeine.de/allgemein/abraham-und-aschram/> (18)

https://hindufocus-wordpress-com.translate.goog/2009/09/20/abraham-brahma-sarah-saraswati/?_x_tr_sl=en&_x_tr_tl=de&_x_tr_hl=de&_x_tr_pto=sc (19)

https://www-academia-edu.translate.goog/4540206/Brahma_and_Abraham_Divine_Covenants_of_Common_Origin?_x_tr_sl=en&_x_tr_tl=de&_x_tr_hl=de&_x_tr_pto=sc (20)

<https://www.israelmagazin.de/torah-tora-thora> (21)

<https://www.wissen.de/lexikon/tora> (22)

<https://www.ziereis-faksimiles.de/faksimiles/qumran-rollen-schriftrollen-vom-toten-meer> (23)

https://de.wikipedia.org/wiki/Schriftrollen_vom_Toten_Meer#: (24)

https://www.academia.edu/3511388/Die_Schriftrollen_von_Qumran_60_Jahre_Wissenschaft_skrimi_am_Toten_Meer (25)

https://s3.eu-central-1.amazonaws.com/coverpubl-erv-01/54095/SP/9783838518633_Leseprobe.pdf (26)

<https://antike-christentum.de/kommagene#Das--K%C3%B6nigreich--Kommagene>

<https://web.archive.org/web/20170107161537/https://haber.sol.org.tr/yazarlar/orhan-gokdemir/isiksizin-karanlik-dusu-181526> (a)

<http://www.sanliurfa.gov.tr/camiler> (b)

<https://web.archive.org/web/20200312221454/https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/4617> (b)

<https://www.jstor.org/stable/41661979> (c)

<https://brockhaus.de/ecs/enzy/article/tukulti-ninurta-i> (C)

<https://www.urfamiz.com/halil-ur-rahman-camii.html>

<https://www-britannica-com.translate.goog/biography/Tukulti-Ninurta-I>

<https://www.uni-muenster.de/Altoriental/forschung/vaa/kar-tukulti-ninurta.html> (d)